


ՀԳՔՐ



ՊԵՆԱՐԵՔԵ ԵԱՆԾԻ ԵՂԵՂԻՄԵ

ԲՆԱՄԱՐ 1

ՄԱՆ. 1983

## TÊXISTÎN

Babet	Rupel
- Pêşgotin .....	3
- Çiyayên bi xwînê avdayê .....	4
- Bilbil û Gul .....	9
- Kêça kêzî kur .....	13
- Em evin .....	14
- Newroza gundê me .....	14
- Çuka ser hêlînê .....	15
- Pêçek .....	16
- Zanîna Kalan .....	17
- Gramatîka Zimanê Kurdî .....	20
- Morfologiya derheqa sewtada .....	22
- Ebdullah Peşew .....	25
- Strana Newrozê .....	30
- Kemalê Tirk .....	32,

\*\*\*\*\*

## PEŞGOTÎN

Xwendevanên delal hemî şaxên xebata mirovanî ya gelê me pêşveçûneke diyar dibînin. Meyzênin li saz û stranên Kurdî ! Weke kulîlkên biharê li her derê Kurdistanê şon tên. Pirtûk, ferheng, helbest, çîrok, wêne - carna tiyatro û sinema jî - û karên kûltûrî yên din, tevî pêwendiyên çetin roj jî ya din bêhtir dibin û digihin pêpêlûkê bilindtir. Rewşa siyasî ya gelê me çetintir dibe, lê têgiştinên kûrtir jî vê rewşe re peyda bûne û pir rêkxirawên Kurd çareyên rêyal di xebatê de sipartî xwe dikin. Ji bona guhertina vê rewşa ne dirist.

Ev kovara di nav destê we de jî, netîcek mezinbûna vê xebata mirovanî, kûltûrîyeyî gelê me ye. Ji alîkî ve hijmara xwendevanên zimanê Kurdî û yên xweşiya wî nasdikin bêhtir bûne, jî aliyê dinve jî nivîsên bi Kurdî bêhtir bûne, xweştir û giranbihatir bûne.

Me dît ku xebîneteke mezine nebelakirin yan bi derengxistina, belakirina nivîsên di nav destên me de gihane hev. Êdî jivir û pêde divê kovarê de, li gor gengaziyên ku xwe eger piçûkbûn jî, wê heyberên lîteratûrî jî meydanake fereh bêne çapkirin. Ji wan ; Rêziman, çîrok û civanok, dîrok, helbest, metelok, mamik, lêkolîn, pîrsa jînan, serpêhatî, problemên xortan, mijûlayî, zanistî û yêndin...

Vêce em hêvîkarin ji her xwendevanên ku dikarin bi Kurdî li ser çî heyberê lîteratûrî bi nivîse, bê derengî jî kovarê re rêbîke.

Deryê kovarê li ber her pênûsên saxlem û hêja vekirye. Rexne û pêşneyarên xwe yên durist, vê bibne hêz û pêşveçûn jî me re.

Bê goman, em pir kêfxweş û şane bi derxistina kovara " STÊR " di destpêka sala Kurdî ya nû de - Newroza 2595'an. Komîta kovarê hemî pîr û kal, jîn û mêr, keç û xortên milete xwe bi baq û gurzên gul û beybûnan pîroz dikin, hêvakarîya xweşi û geşî û pêşveçûna wan dikin. Cejna we pîroz be.

STÊR ★

\*\*\*\*\*

ÇIYAYÊN BI XWÎNÊ  
A V D A Y Î

Nivîskar:  
Bavê Nazê

Diyari

Bo:

Bavê min ku mîr û min nedit.

Dayka min ku çavnehêra vegeza min e.

Keça min ku, ya ez bi hêvîme bibe kulilkek di gulzanê welatê min de.  
Bırçiyên Kurdistanê.

Yên xwe kîrîn gori da rê bo me bîkî ronî.

Kesên hevgerîna Kawa yê karên granbîha kîrîn bo ronakbîriya mîletê  
me. U nîya xebatê jê re bêtîr doz kîrîn.

Vê pirtûkê diyari dîkîm.

Bavê Nazê  
Gulan 1978

Berê yekem

"Dî cihanê de du raman dijîn: Yek jî wan bî degelî li tariya jîyanê, ya ne-  
nas dinêre û dîxwaze wê jî hev derxe. Ya dîn baweriyê tine ku evrazîn nayên  
nasin, lewra jî wan ditirse û koletiyê bo wan dîke".

(Jî têbirên Maksim Gorkî.)

Para Yekem.

Paşî xewekw kîr û dirêj çiyayên Omerîyan şîyar bûn. Berf li serê kûp û zî-  
naran û li taldên çîyan behîz (zabe) û tenha ma di kort û kûrgîhan de, di derên  
dûri ronî tirêjên xorşîd de. Belazîz belbûn û dar pîkîvin, çûk û çivîk û şalûlan  
dest bî çîrin û stranan kîrîn. Tevger û çûn û hatîna kete nav kes û mirovan de.  
Her tişt şîyar bû, mirov û xwerîst bî hev re ketîna jîyaneke nû de. Darên mêvan  
jî bî çenci, delalî û bêxîretî serê şaxên xwe rakîrîn, ber ku zaniin ew bî tenha  
bingeha xweşî û geşîya vî warîne, lewra guhdanê dîxwazîn. Bî kurtî "Bîhar  
hat".

Rojekê zû jî rojên vê Bîharê, kufletekî jî şeş kesên li gundê "Pîşkeftê"  
pirtîr bû. Barê xwe dani û bî malîti kete kavîleki wêran ku jî du salan de kes-  
dûnde û vala bû.

Oaso pîr kêfxweş bû bî xaniyê xwe yê nû, jî ber ku nêzîkî mîzgeftê bû.  
Wî jî nîmetên civakî hes dîkr û fêrî wan bûbû. Wî jî bavê vî kufletî re di go-  
tîna. Bî ser pêncî salên wî de hine tev xortanî û tevger bû. U keftelefta jîyanê  
hêz û hêz hîşkati dabûn wî. Jîna wî Zerê kîn bû bî lebt û tevger bû. Oermî-  
çonk û xetironkên ruyê wê jî û dijwari diyar dîkîrîn, lê jî reng û madê wê  
dîlxweşî xuya bû.

Dibû ku "Zerê" diya heşt zarokan ba, eger kurê duhem, paşi heftiyekê ji bûna xwe, ne mirîba. Tani roja iro, mirîna wi di vegerine lêdana periyana, yan jî di bêje: 'Bî heftekan mur'. Wîlo jî herdû keçîkên ku li berbûnê mirin, yêni ku zayîna wan pîr zor û gran hat. Lê Xecê, ya tani roja iro jî dilê Zerê derneketiye, di buharan çaran de bî sorîkan ket û mur. Ev, bî du salan, jî Şewçaya piçûktir bû. Niha wê şazde salî be, eger maba sax, wîlo Zerê bî xemgîni û keserkûrî dîgot, û pê re li xwe di vegerand: 'Xwedêyo, tu li min negurê... te da û te bir, da bibe goriya xwişk û birayên xwe. Xwedêyo, tu li min bibûre... eger ez gotinên ne di rê de dibêjim...' U wê re-pê re bî şewat û kulgrani hêstir di barandin û digri.

Mezintir û dilovantirê zarokên wan Çeto bû. Di piçûkaniya xwe de hûr û laxer û gor bû, kêm tevger û dêm gewr bû. Lê niha, paşi bist û yek salan, bûye bî hêz û zend û bend, waji, berze bihçine. Di nêrin û awrên wi de xurtî, nermî û xemgîni xweş diyan. Ev tişt tev xuya bûn di çavên Çeto de û çeşmeyên wi bûbuna neynika kîrveşartiyên nava wi û waji hubuna neynika lebt û tevrecûnên wi. Lê gewr bûna wi bûbû esmer bûn. Dibê ku esmerbûna wi jî karê pîr, jî beyanî tani êvarê, di nav rezan de hatibe.

Hîna heftek di ser hatîna malbata Oaso li vi gundi derbas ne bûbû. Katê ku Çeto her tişt li ser zewaca Xanimê jî Abdo nasîkr. U çawa Abdo jînbûra xwe mehrîkr-birayê wi berî salekê mirî bû-û niha digere, ku dan û standinên xwe bî malbata birayê xwe re pirtir girê de û xweş bike, bî mehrîkîna biraziya xwe û kûrê xwe Mîsto, û waji xweştîna Gulê, keça şazde salî jî kurê birayê xwe Xelo re, bî ser ku ew bî çar salan jî wê piçûktire.

Kesên Abdo xweş dinasin, dibêjin, ku wê bî saz û helperk û govendê şahûya guheztinê bike, eger mela jî bixeyîde -mela nahêle gundi di şahiyande li sazîna bîdî, nemaze def û zîrne- jî ber kû Abdo ne murîdê wiye û yek jî wan kesên ku narîna muzgeftê pêvî rojên û di cejnî de. Hinek dibêjin -eger ne jî lêpirsariya gundiyan ba, lingê Abdo bî muzgeftê ne dîket û zîka jî ne dida, û eger zani ba, ku wê jî wi re here seri para axê jî, jî zad û mevjên xwe ne dida. Ev tev jî çûrki û destgirtibûna wi ye.

Belki Abdo ev gotinên gundiyan dibîhist û zanibû û jî wan agadar bû, bo wîlo jî, xwest wan derevî û gotîngîrî bîde diyarîkrî. Lewra, bî roja çarşemê re dengê def û zîrnê burz bû û bî xurtî hate lêdan. Mîrov dibêje ku ev dengê han dibake kesên dîr, da bêne helperk û semayê, da kêf û şahî destpê bikin û da her evîndarên ku naxwazî li malên xwe rûnî li vîr bîgînin hev, da bî hevîre bîkînin û awîran jî hev bîdîzin. Bere detên xwe tîxin destên hev, da evîni bî laşên wan de bîmeşe. Da xortaniyan wan bî gul û çiçek bike. Ma xwene mîrov çend caran dijî?

Abdo xweş dinasi ku bî wê kêf û şahiyê "du çûkan bî kevîreki di kuje". Jî hêlekê de her dî dawetên xwe krîn yek. Nemaze dawet ya wiye û wi divêgere. Jî ber ku jî iro pêde wê zarokên birayê wi li ser navê wi bî. Jî hêlek dîne jî, keçê nav nêzik dibê û bî wê yekê wê karîbe wan bîser xwe de bîkîşîne û jî tevan bêtir Xelo yê piçûk. Bî vi rengî jî wê karîbe gelek devan jî ser xwe bî guhere. Devên wan kesên ku wi bî qurîncitî û destgirtiyê dinasin û bî şev û roj gotînan li ser diguhêzin û belavdîkn. Bo van tiştan, ew perên ku li dawetê herî li ber çavên wi nayên. Ne perên ku bîde bî xelatan û mîrban, û waji ne bîzin û kehra ku roja inê bêne gurandin.

Gulê xweşıktirin çekên xwe li ber xwe kiribûn. U di vê xeml û xêlê de xweşıktir bûbû. Ebûyên tenik û çeşmeyên reş kalkiri ew mezintir ji salên wê dari çavan diyar dikirin. Bejna xwe bi kembereke stûri zêrin girêda bû, tani weke noça mirûyê zirav kiribû wekî ûçikê di nava gustilkê re bê kişandin. Her dû memkên glover weku du bombelanan serê xwe hildabûn. Van tîştan bêtir bi mêbûn ew didan ber çavan. Her du destên wê ji bazinên ziv û zêr de xemilîn û bisk û guliyên xwe bi dur û sedefên hûr xemilandibûn, di westê ku heyvoka zêr li ser eyina wê, li ber tirêjên rojê, dîçirîsî û xedengên ronîya xwe di berdan çavan.

Gava awirên Çeto pê ketin dilê wi bi xurti lêda, tani dixwest wekî çûkeki derkeve û bi fire. Pêre-pêre xwin bi germi di rahên wi de geriya. Ji nişka ve çilmîsî û pûnîjî, bi dil wi kû her kesên liwîr temaşa wi dikin. Ji wa zû xwe ji pêş çavan windakir û çû. Gulê tê negihîşt bo çî ew wîsa zû çû, lê nexwest awirên xwe li pey wi rê bike û zanibû ku lînêrina wi bê qezence. Ji ber kû ji eşîreke din e. Lê wi şûna xwe di dilê Gulê de çê kir. Bi ser ku wê nasnekr çîma wîlo bi wi ve hate girêdan.

Çiyayê Birati ji bakurê gundê P şkeftê ve weku sitûneke kevnare, serê xwe ber bi esmana ve dike û gund ji rezan dibire. Ji rojava ve çitayê Dîgura gund dixê hîmbêza xwe de, û dar û devi li ser herdû giran belavdibin û dixemilîn. Ji hîla xwar ve ji deşteke piçûk pan dibe û li devdawa xwe ya xwar dibe besta Sêkaşa. Ji tevan ji bilintir çiyayê şêran berz dibe û koka xwe bi panbûn diberde nava zemîne. Reçik û rêbar, kaş û newalên wi pîr zorn bi çun û hatinên xwe. Li ber ava kulorika rojê roja havînê di nav çiyân de li vir gewre û mezînan diyar dibe. Tani mirov bawer dike, roj dikeve nav daran, yan jî bi dilovani şax û perên xwe di ser çiyân re dibe. Weku dayîka destên xwe di ser serên zarokên xwe re bibe. Eve katê vegera çiyayîyan ji ber pez û dewaran û wajî ji nav rezan. Ev kêlikên ber êvaran dibine bexçên evindaran, pêrgî hev dibin û sozên bi dîzi ji hev distînin.

Gava Çeto ji nav zêr vegeriya bawer nedikir ku Gulê ji berbi wi tê. Hêvi dikir ku pêrgî wê biba. U katê nêzikayi li hev kirin bê hemd herdû di cihê xwe de rawestan û ji fediya tar û şaş bûn. Wîlo bê deng her dû li hev rawestan û Çeto bi lerz destên xwe xistin bêrikên xwe wekî kesên tîşteki xwe wînda kiribe. Bi evindari li Gulê neri. Gulê ji serê xwe bêdengi ber bi jêr ve kir û çavên xwe bi xwar de sist kirin. Hingo Gulê serê xwe rakir awirên wan li hev ketin. Lê wê, lîber xedengên çeşmeyên Çeto xwe negirt û ji nûve çavên xwe daxistin. Hînarikên rûwê wê ji fedibûna bûne rengê sorgulan. Çeto ji kete reng evineyeke nû û beyan, ku hina ne ditibû. Dilê wi hat guvaştin û bi xurti lêda. Rast ku bi dest û lîngan kete davên evindariyê û nema kare xwe derxe. Hinga naskir ku ji wê heskir û evina wê kete dilê wi û hêlina xwe bi xurti têda şêland û kufand. Lê Gulê, wekî nêrgîza mest bi xwe mîjûl bû û xwe sîparte gomanên xwe:

"Xwedêyo, ev çiyê? Ma min ji wi heskir? Ma evindari halo hêsani çêdibe? .. Ez nîzanim..Gelo roja daweta birayê xwe min ji wi heskir? ..Lê iro ji nişka ve kete bala wê ku rawestandina wan ne cihê xwe de ye, û ne dirîste. Lewra kir bimeşe. Lê beri bimeşe awireke evini ji wi da û pêre beşîşî, û meşî bê ku soza pêrgheviyê bihev re bidin.



Wê şevê tani destê sibê xwe nekete çavê Çeto. Ji xwe ma dilhayî, çima perda dilê xwe jî wê re nevekr û li ber neraxist. Geleki mijîl bû gha wê baweriyê ku ev evin wê bi nexweşiyên pêçayî be. Lê eger dan û sitandinên herdu malan başba û têkhyên wan xweş ba, hebû ku şa dilê wan bi ci biba. Weke ku jîbirkiribû, yan jî dixwest jî bir bike têkhyên nû di nav wê û Xelo de. Bê ku li bira xwe bîhê kûrbûn û gurbûna vê berberî û bendîtîya kurani, ya ku bi dehên salan rahên xwe kû berdane û bi dehên kuştîyan di nav wan de raxistane. Bi kûri di nava xwe de êşîya gava gha baweriyê ku ev evindari bi xweşî û hêsa naçe seri. Lê evina wi ya yekemin û nûçe di jiyana wi de huşt ku xwe bixapine. Bo wilo soz bi xwe re da û biryar girt da roja bê di wi kati de here wi çihî. Xweş bawer bû, bê kû zanibe li ser çî binglan ke nedûre ew jî bigihe biryarekî halo û bê wi çihî. Gulê jî, li mal wa mijîl dibû û wa biryar sitand bi çûnê. Dilê wê jî weku yê wi, jî evinê hatibû pingandin, tani nema karibû xwe li xwe bigre, û gha wê baweriyê ku kes li ber çavên wê pêwî Çeto tune. Belki jî evindariya keçên çiyayî xwe disîpêre gomanan jî huş bêtir.

Wilo berî rojava Gulê, jî nav rezan vegeyîya û berê xwe da şûna doh di katê ku Çeto jî li ser rê bû ber bi wê. (Çeto iro beyani ne çûbû nav rez). Meşîyan û hêviyên pergheviyê bi wan re di meşin. Pêrgî hev hatin. Herduwan zanibûn ku bavkên wan berberîtiya hev dikin. Gihîştin hev û hêviyên gihîştina herdemî wan bernadîn. Pêrgî hev hatin û jî pêrgheviye bitirs bûn. Tirsîyan, ber ku pêrghevi tenê bese da dawîya jiyana wan deyne. Lê hoşaniya bi wanre hatî bû afirandin bes bû. Ku berê xwe bîdîn mirinê û jê netursin. Ma wê ev evindariya gewre bikaribe binghên xwe di nivê gola jî hev pingandin, neheskirin û berberîtiyê de deyne? Û ma gul dikarin di golên gemar û bi kevz de şin bîhê? Gihîştin hev û pir bi hêvîbûn, ku şûna van golan bîkî gulzar.

Demek dirêj di çûna xwe de rexep westan û sar man, tani Çeto destpê kr û got:

"Gelo ev tu yî? Ez jî çavên xwe nebawerim! Tu nizanê çiçasi bi ditinate kêfxweş û şa me? Ma tu jî hatina xwe natirsî?"

Çeto wilo got, lê gotin sîvk û bi lerez jî nav lêvên wi derdiketin. Hem jî bayê evinê hem jî jî şahiyê. Hingo Gulê serê xwe rakr jî nûve awirên wan li hev rast hatin, pêre hîmarkên ruwê wê sorbûn û bê deng û gotin serê xwe disa berda ber xwe.

Ji tîrsa ku herdu jî nûve bê deng û lal bîminin, Çeto cardin peyivî:

"Min zanibû ku tê bîyî. Weku sed kes jî min re bîhêjn ku tê bîyî. Bi xwe-dê min zanibû tê bê. Dilê min jî min re digot ku tê bê. Û eger tu nehatibayî jî ezê hatibama. Tu nîzani çiçasi başbû ku tu hati".

Û bi gotinên xwe re bi destên lerzî rahîşte destê Gulê û tihyên weku mûman bi nermî û dilovani guvaştin. Hînga germî û xweşîya evinê ya ku hina ne ditibûn, bi laşên wan de hêdî hêdî meşîya. Gulê destê xwe bi nermî jî destê wi derxist û got:

"Bihêle ez herim malê. Lê..." Çeto gotina wê birî:

"Lê çî? Hina em nepeyivine. Na ez hêvidarim!. Were kêlikekê li vir rûn." Û destê xwe bi latekê ve kr, ku çend gavan jî wan dîr bû.

"-Ez nikarim nêzîke ku roj here ava."

Çeto nexwest pêldariya wê bêtir bike, gotina wê wergirt û got:

"-başe..Lê tu kari beri rojava weri vir? Gelek tiştan dixwazim jî te re bî-bêjim."

"-Ez nizanîm. Û belkî jî iro pêve em hev nebinim. Bî rasti şaşîke pîr mezin bî hatina xwe ya vir min kir."

Gulê wîlo got bê ku karibe pêldariya xwe veşêre, û xwest bimeşe lê Çeto got:

"-Dilbera min, ez jî te hêvi dîkîm, ku bî tiştêkî ne di rê de mijûl nebi. Û hêlîna hêviyên min wêran neke. Belkî tu bawer nake û tinazên xwe bî min bike eger bêjim 'ez hes jî te dîkîm, koletiyê bo te dîkîm, û eger min zaniba, ku hertîşt wê di cihê xwe de bê, ezê te iro jî meruvên te bixwazim, ne sibê."

Dilê Gulê gete cih û hûnek arami dit, nemaze cara yekemîn dibihize ku mêrek bî vi rengî bî wêre dipeyve. Wê jî bêhna xwe kûr kuşand û got:


"-Jî wîlo ez dibinim ku ditîna me jî hevîrê bê bere -û xwest evindariya xwe bide xuyakirîn- Çeto, heskîrîna te jî kete dilê min. Jî roja daweta brayê min ve lê ez jî weke te dibinim ku dem jî me bî hêztare û keys û klitên wê ne di destên me de ne."

"-Ezê avê jî latan derxinim, da ya dilê me bî cih bibê."

"-Tu rê li pêşîya me jî revandinê pêve ninin."

"-Xweşîka min, tu xweş zanê ku kuştin û xwin li pey revandinê heye! Ev rûniştîneke dirêj dixwaze. Tu xweş zanê ku serpêhatinên revandinê pîr gran û genine. Heye bî dehên kuştîyan di ber de bîkevin û bêne raxistin. Başture em ditîna bê li ser bipeyivim. Beyanî livir ez li benda te me. Ma tê sozê bî hatinê de? "

"-Ez nizanîm." Gulê ev got û rîya xwe di nav gulmestan re girt û bî mijûlî lezand.





## BILBİL Ü GUL



"Ezê dilanê bî te re bîkım ku tu guleke sor jî minre bine" Keça mamoste gote xwenda kareki xort.

Xort xemgin vegeriya mal û jî xwe di pîrsî: "Gelo ez çî bîkım? Gulên sor di baxçê min de ninin!"

Di hêlina xwe de, li ser dara beruwê bilbil deng kr û li dora xwe dînerî.

"Tu gulên sor di baxçê min de ninin" xwendekar di bakr û çavên wi yê n xweşîk hestiran dadıgirtin.

"Şahi bî tıştên gele k biçûk ve grêdayîye! Min gele k nîvisandinên kevnara xwendine, û felsefe kûr naskriye, lê jîna min jî bo guleke sor bî xeme." Xwendekar jî xwe ra dıgot.

"Dawî, vaye evindareki rast"? Bilbil got:

"Şev li pey şevê min jî re dıstrand, di gel ku min nasnedıkr: çiroka wi min jî stêran re dıgot û niha ez dibinim pora wi weke guleke reş e, lêvên wi sonn weke kulilka gulê, lê evinê temari bîserde anıye."

"İşev na şeveke dın, wê mir şahıyekê deyne, û evindara min wê bêyê." Bu pıste-pıste xwendekar.

"Eger ez gul sor jê re bîbım wê dilanê heya şefaçê bî min re bıke, ezê destên xwe lê bıpêçım, dime ber singa xwe, serê xwe wê deyne ser milê min û destên wê wê dıdestê min de bin." Lê ti gulên sor di baxçê min de ninin; loma ezê bitena xwe rûnim, pêça xwe wê nede min û dilê min wê bışkê". Xwendekar jî xwe ra dıgot. "Dawî vaye evindareki rast" bilbil dibakır "Ez li ser çî dıstrênim, ew li ser di nale; çî min re şahıye, jê re xeme. Evin tışteki giranbıhayê, hin jî zêr û peran bıhatıre û kes nı kare bî peran bıkre."

Xwendekarê xort disa jî xwe ra dıgot:

"Sazbend wê li ser textikê xwe rûnim û bêjın. Evindara min wê li ber helbest û mûsıqa wan dilanê bıke. Evindara min wê dilaneke sıvık bıke, ku ligên wê neghêjın erdê û hemi xort wê bıxwazın dilanê di destên wê de bıkan. Lê destên min nagıre û dilanê bî min re nake, jî ber ku gula sor nine da ez bıd-mê."

Xew avête ser geyê, ruwê xwe xıste nav destên xwe û dest bî giri kr.

"Çıma ev xortê rınd dıgri"? Çûk dîvê xwe li pey xwe dıqşand û pırsi.

"Bî rasti çıma dıgri"? Pırpırık li dora xwendekar di ziviri û di bakr.

"Bî rasti çıma? " Gula baharê bî dengê xweyi zırav dıxıste pıstepıst.

"Li ser guleke sor dıgri" Bilbil jî van re got.

"Li ser guleke sor? " Bî hevre bakrın "Ev çî bê mējıye!" Ü çûkê biçûk keneki bılınd kr.

Lê bilbil derdê xwendekar naskar û bê deng li ser dara berûwê rûnişt, kûr kete mitala evinê û xwendekar.

Ji nişkkava bilbil perê xweyi rengin jî hev ve kirin, xwe hilda ezmana û nav daran û ser bexçan re firi.

Dî nava bexçeki de bilbil dareka gula dit, firi balê û got: "Guleke sor bide min û ezê jî tera straneke here xweş bêjm."

Lê dara gula serê xwe hejand û got: "Gulên min hemi sîpine weke nivîşkê biharê û jî berfa serê çiya sîpitirîn; Lê meyzeke! ha waye xuha min here balê, gereke daxaza te bide te."

Bilbil firi serê dara dîn û weke goti xuyha wê gotiye:

"Guleke sor bide min ezê strana xweyi heri xweş jî te re bêjm." Dara gulê serê xwe dîsa hejand û got: "Gulên min zerîn, zerîn weke pora bûka biharê. Û jî nergizên beriyê zertirîn. Lê here cem xuha min dara gula, li ber pencera xwendekare, gereke daxwaza te li cem peyde bibe"

Bilbil firi û gîha dara gulê li ber pencera xwendekar. Û bakir: "Guleke sor bide min ezê jî tere strana xweyi here xweş bêjm."

Lê darê serê xwe weke herdu xuhên xwe hejand û got: "Gulên min sorîn, sorîn weke lîgên kevoka û jî mircanan sortirîn lê zivistanê kulîlkê min qerîşandine. Û ba çuqîkê min şikandine. Ji ber vê yekê ez tu kulîlkan nagrîm."

Bilbil bî şewat bakir: "Ez bitenê gulê dîvim, bitenê gulsorekê! Çawa ezê peyda bikim?"

Darê lê vegerand: "Yek çare bî tenê heye, lê belê çareke pîr zor e. Ez dîrsim jî tere bêjm."

"Bêje min!" Bilbil bakir. "Bêje, ez natîrsim"

Dara gulê bakir: "Eger tu geleke sor dîvi, divê ku stranan bî tava heyvê bêjî û bî xwina dilê xwe gulê sor biki. Divê ku tu jî min re bistrîni û singa xwe dî sîtrîki minreki. Divê tu şevê tevi bistrîni û strîyê min dî singa te here, da çuqîyên min xwina dilê te bîmîjn."

"Mirin bihakî mezine jî bo gulekê. Jiyan xweşe jî bo herkesî. Pîr xweşe ku yek li ser çuqîki şîn rûne û li rojê û heyvê bî nêre. Lê tim evin jî jîyanê xweştîre û dawî dilê Bilbilekî ma li ber dilê mirovekî çîye?" Bilbil jî xwe re dî got. Perê xwe jî hev vekirin û da xwe weke periyekê li nav baxça û nav daran re firi.

Xwendekarê ciwan hê li ser gelê xwe avêtibu, hêstir jî çavên wiyên delal di herikin.

"Şahiya xwe bîne" Bilbil bakir. "Gula sor wê bibe ya te. Ezê gulê bî strana xwe li ber tavê heyvê şîn bikim. Lê belê yek daxwaza min jî te ku tu li min vegeirîne, û tu bibî evîndarekî rast. Ji ber ku evîn jî felsefê bî ratîre û jî zorê bî hêztîre. Laş û baskên wê wekê pêtîne. Lêvên wê hingivîn û şêrînin, û behna wê weke bêhna gulaye."

Xwendekar jî ser geyê rabu û hisand. Lê hîn ne dibû ku Bilbil çî jê re dî bêje. Ji ber ku, jî pirtûkan bî tenê hîn di bû. Dara berûwê jî bilbil hîn bû û xemgîn bû. Ji ber ku Bilbil hêlîna xwe li ser çuqîyên wê çêdikir û li ber dilê wê biha bû.

Darê bakir : -"Strana dawî ji minre bêje, gava tu bimrî ezê mênime bi tenê."

Bilbil ji darê re strand û dengê wî yê xweş, şêrîn û xemgîn dibû.

Ku Bilbil strana xwe temem kir, xwendekar pê nûs û kaxezên xwe ji bêrî-ka xwe derxistin û ji xwe re di got : - "Ev Bilbil stranbêjeki xweşikê, lê gelo êş û xweşiyana nasdike ? Ez ditirsim ku nasneke. Bi rastî ew jî weke hemî dengbêjan distrîne bê ku zanibe çi di bêje ! Ew tu caran nikare tişteki ji kesekî re bike û nake. Bi tenê bi strana xwe mijûl dibe û herkes dizane ku dênbêj xwe perestî. Awazne pir xweş di dengê wî de hene, lê çi feyde ku bê manene. Xwendekar wisa ji xwe re di-got û dikete ramanan. Xwe avête ser textê xweyî biçûk û bi evîna xwe mijûl bu. Kêlîkek ne çû kete xeweke şêrîn.

Çawa heyv derket Bilbil firî serê dara gulê li ber pencera xwendekar û sînga xwe bi ser strîkî darê ve bir. Şev di-çû û Bilbil li peyhev distrand, û strî hê kurtir di sînga wî de di çû xwar. Çuqliyên darê xwîna wî di-mijîn. Destpêkê Bilbil stranek li ser nûevîna xort û keçikê got. Çawa stranê da pey stranê ûsa guleke xweşik li ser darê şîn û gêş di bu. Pêşi gul bê reng bû. Weke rengê nexweşekî, weke rengê aviya sibê li ber çêman. Lê darê bakire Bilbil da sînga xwe hê bihêşîne herbistrîde berî ku roj derkeve. Da gul sor bibe.

Bilbil bi lez sînga xwe bi ser strî de bir. U dengê strana wî bilind û bilind dibû. Strana wî bûbu evîna di canê mirov û mirovekê de. Pelên darê geş bûbun weke rûwê zavê gava lêvên bûkê maç dike. Hê strî negiha bu dilê Bilbil jî ber wilo nava gulê sipî mabu. Bi tenê xwîna dilê Bilbil dikare dilpe gulê sor bike.

Darê careke din bakire Bilbil, da xwe bêhtir bide bi ser strîdê, lê wê roj hile berî ku gul tev sor bibe. Bilbil xwe bi ser strîde dara te giha dilê wî. Êşeke dijwar pê kett. Êş xurt dibu, xurt dibu û stran bilind û bilind dibu. Ji ber ku stran bûbu evîna nemir.

Gul tev sor bu weke Yaçût, lê dengê Bilbil zirav dibu, baskên wî sist dibûn û xeyal diketin ber çavên wî. Stran zirav, zirav bû û bêhna wî teng dibu weke kû destek bikeve çirikê. Dawî, yek awaz jî strana xwe got, Heyvê bihîst şeveq ji bîrkir û ma li azmana. Gulê deng kir, jî serî ta binî heja û rûçkên xwe ji bayê sibêyî sar re vekirin. Newal û Zinaran dengê stranê li hev vegeandin û şivanên razayî jî xewnan şiyarkirin. Deng giha çem, û çam giha Deryayê.

"Mêzeyeke, mêzeyeke" darê bakir. -"Gul tev şînbû." Lê Bilbil lê ne vegeand. Ketibû ser geyê, strî di dilde can berda bû.

Nêzîkî nîro xwendekar pencera xwe vekir û nerî.

"- Ev çiye ez dibînim, ez bawernakim ? " Xwendekar bakir.

- " Vaye guleke sor ! Min yên wek wê hê ne dîtine. "

Xwendekar xwe nizim kir û gul jêkir. U piştê kum da serê xwe gul di dest de bazda ber mala mamosta. Keça mamosta li ber derî runişti bu û kûçikê wê yê biçûk li ber lingê wê bu.

" Vaye gula herî sor di dinyayê de " Xwendekar bakir.

- "Işev gulê deyne ser dilê xwe û gava em bi hevê bikevin dilanê wê jî tere bêje çendî ez ji te hisdikim. "

Lê keça mamosta pêça xwe nedayê. U bi madekî tîrş lê vegeand. "- Ez ditirsim ku gula te nekeve rengê kirasê min. Ji alîkî din ve kurê birayê mîr hi-

nek zêrên delal ji min re şiyandine û herkes di zane ku bihayê wan jî yê gulan bêhtirin."

- "Başê ; lê xuyaye ku tu ne xwedya soza xweyî." Xwendekar bi bêhn-tengayî got û gul avê te sikakê, gul kete riya paytonekê û da ser.

- "Ne xwedya soza xwe" keça mamosta bakir, "Tu pir hişkî, û piştê tu kîyî ? Bitenê xwendekarekî şepirzeyî ! Ez ne behwerim ku soleke te weke ya kurê birayê min hebe." U rabu ser xwe kete hindur.

- "Evîn, çi tiştêkî valaye !" Xwendekar bi riya malê de jî xwe ra di got.

- "Ti caran nabe weke locikê û nikare tiştêkî bêne meydanê. Evin, her dem tiştên ku nayên cih jî mere di bêjin, û dihêle em bi tiştên ne rast bawer bikin. Bi rastî evîn, ne tiştêkî zanistiye. Ji ber vê yekê ezê vegerim felsefê."

Xwendekar vegehiha oda xwe, destê xwe avê te pirtûkeke toz girtî û dest bi xwendinê kir.

Nivîskar : OSCAR WILD

Werger : HEVÎND



## KÊÇA KEZÎ KUR

Hebû kêçek û hebû sipihêk. Sipih mir, kêçê kezîka xwe kur kir.

Siwerek derkete nêçûrê, pêrgî kêça kezî kur bû, got :

- "Çima kêça kezî kur ? "

- "Ha.. hew siwaro, Kêça kezî kur bersiv hat û sipih mir."

Siwar meşiya û pêrgî kîvroşkê bû, ku va kîvroşkê dûvê xwe di berve jê kiriye, got :

- "Çima kîvroşka dûvqut ? "

- "Ha.. hew siwaro, kîvroşka dûvqut, kêça kezî kur, bersiv hat û sipih mir."

Siwar jî şaşika xwe kesk kir û di ber darekê re çû. Darê got :

- "Çima siwarê şaşik şîn ! ? "

- "Hew.. darê, siwarê şaşik şîn, kîvroşka dûvqut, kêça kezî kur, bersiv hat û sipih mir."

Darê jî xur-xur-pelên xwe weşandin, keviran got :

- "Çima darê pelweşin ! ? "

- "Hew.. kevîrno, dara pelweşin siwarê şaşik şîn, kîvroşka dûvqut, kêça kezî kur, bersiv hat û sipih mir."

Keviran jî go req-req-req serê xwe li hev xistin. Avê got :

- "Çima kevîrên reqreqin ! ? "

- "Hew.. avê kevîrên reqreqin, dara pelweşin, siwarê şaşik şîn, kîvroşka dûvqut, kêça kezî kur, bersiv hat û sipih mir."

Avê jî got xuş-xuş-xuş, xwe nav garisan rast kir. Garisan got :

- "Çima ava xuşxuşin ! ? "

- "Hew.. gariso, ava xuşxuşin, kevîrên reqreqin, dara pelweşin, siwarê şaşik şîn, kîvroşka dûvqut, kêça kezî kur, bersiv hat û sipih mir."

Garisan jî serê xwe xwar kir. Xwediyê wan hate nav wan û got :

- "Çima garisê ser xwar ? "

- "Ha.. hew garisê stû xwar, ava xuşxuşin, kevîrên reqreqin, dara pelweşin, siwarê şaşik şîn, kîvroşka dûvqut, kêça kezî kur, bersiv hat û sipih mir."

Wî jî mera xwe çikand û bi xemgîni runişt. Keça wî hat û got :

- "Çima bavê min xemgîn ! ? "

- "Lawo, bavê te xemgîn, garisê me stû xwar, ava xuşxuşin, kevîrên reqreqin, dara pelweşin, siwarê şaşik şîn, kîvroşka dûvqut, kêça kezî kur, bersiv hat û sipih mir."

Keçê jî mastê xwe bi ser serê xwe dakir û berê xwe da malê. Diya wê got :

- "Lawo, çima tu ser bi mastî ! ? "

- "Hew yadê, keça ser bi mast, bavê min xemgîn, garisê me stû xwar, ava xuşxuşîn, kevîrên reqreqîn, dara pelweşîn, siwarê şaşik şîn, kîvroşka dûvqut, kêça kezî kur, bersiv hat û sipih mir."

Dê jî hêsir bi ser ardê xwe de barandin û hevîrê xwe bi wan striha û di bere nehvirand : Dêya dest hevîr, keça ser bi mast, mêrê min xemgîn, garisê stû xwar, ava xuşxuşîn, kevîrên reqreqîn, dara pelweşîn, siwarê şaşik şîn, kîvroşka dûvqut, kêça kezî kur, bersiv hat û sipih mir.

Berhevdana ARO

\* \* \* \* \*

### EM EVÎN

Bi talan û bi girtin, her bi kuştin,  
Serî qet ne tewandin, he xwe hiştin,  
Belê, îro ne tolazin, ne xiştin.  
Û herwa jî ne şêxin, ne nivîştin,  
Emî êsta bi dostin, her bi piştin  
Hemî şaşî bi gorî, tev me miştin,  
Ji millet em bi hêzin qet ne sistin  
De îro rêç duristin - marksistin.



ARO

### NEWROZA GUNDÊ ME

Hawirdorê gundê me, hemî kaşin kendalin  
Dora çemê me yê Zil şînebestin newalin  
Îro tev malbatên me, bê malî û bermalîn,  
Birek derket bi şahî, hemî xifşîn, hevalin,  
Ji nêzik û ji dûrî, bi dêmin pir delalîn,  
De gava ku di rabin, weku pêlan di nalin,  
Bi bexet û bi rastî, tev çiçekin, şepalîn,  
Eger bê jim bi kurtî; bi rengin tev bi şalîn,  
De gava ku bi ger bin, sazên me her xerxalîn,  
Li Newroza gunda me, zarok û xort û kalîn,  
Bi govend û bi dîlan, dora xwe tev di malîn,  
Êvar - reşe ku dihat, bo Kawa sore - alîn.



ARO



## ÇÛKA SER HÊLÎNÊ

Bihar bû. Rojê xweş bû. Ji her aliya bêhna gul û geyê dihat, xuşa - xuşa avên kehniyan bûn, li ezmanê sayî teyr û tilûr difirîn, diçûn, dihatin hewa bir dibûn diçûne cihên dût. Ez û diya xwe diçûn gundê cinarê me, wekî çend dîza, kûpa, kaska binin. Diya min hey destê min digirt, carna min destê wê diberda ; direvîm, dikenim û direqisûm. Ez bêxem bûm.

Gava em nêzîkî gund dibûn û wê demê min kevirek hilda û avête çûkekî. Çûk li alîkî ket, kire çîwçîw, paşê rabû kir ku bifire, lê nikaribû. Wî çaxî ew bi linga revî. Min da pey û girt. Diya min, gava çûk di destê min de dit, kire gazî, hat gihişte min. Çûkê bê çare ji destê min girt, hêrs bû û got :

- "Lawo, te çima wisa kir, ne ev çûka ser hêlinêye, kî dizane hêlîna wê niha li kûderê ye. Ji bona çî te lêxist ? "

- "Dayê, ji destê min çû, ez jî zanim. Lê tu çawa dizanî wekî ya ser hêlinêye ? "

- "Lawo," ewê got : "Ya pêşî niha bihare, wextê hêlin kirinê ye û çûçik derxistinêye, ya diduwa te çima zilke nav niklê wê de nedît ? " Û wê pêrê çûkê ji xwinê temiz kir, lingê wê girêda, paşê da min wekî berdim. Min berda. Çûk firî, lê gelekî ne çû, li cihêkî nêzik danî, berê xwe da min, mirov digot, dixwaze bêje min : "Te çima per û bazkê min şkandin ? " Ez revim, wekî dîse bigrim. Min ji diya xwe re got, ezê bibim malê, bere xwişka min per û bazkê wê bi cebirine lê diya min nehişt û got :

- "Lawo, ew xiraptire, wekî em bibin mal, per û bazkê wê jî bêne cebirandinê, ew teyax nade. Hêlîna wê li wan dera ye, ewê li cihê dût, bê hêlin, bê hêk û çîçik şker bibe. Pak ewe, wekî tu wê li vir ji bextê wê re bihêlî."

Em çûn, lê vê carê ne min xeber dida, ne jî min zarotî dikir. Gava em gihiştine gund, me kar pê kanî û vegehan, min kirê dilê xwe, wekî wê çûka birindar kere - ker bigrim, bibim malê. Birina wê bidime qenckirinê û dîse binim wî cihê, bi destê xwe berdim. Lê gelekî lê geram min nedît. Diya min jî dîna xwe da her cihî, dîsa nedît.

Em êdî hatin.

Ji wê roja biharê ta niha jî çil salî bêtir derbas bûne, lê ez di derbara wê çûkê nikarim jî bîr bikim, wekî min cihê bela - sebeb lêda.....

\*\*\*\*\*

## P Ê Ç E K

Li ber dergûşê xwe berda ser çokan û bi lez destê çepê avête benkê hevrişmî rengereng. Destê rastê jî, pêre avête pişkok û qumçên êlek û bersingên xwe û paxilên xwe yên germ derxistin. Katê sira bayê hinik li wan xist, herdu memkên tiji şîrê tavdayî, weke du tîrhên rîhanan sere xwe rakirin. Hinga pişta xwe vekir û bi giştî jî kemberê azad kir.

Bi dilovanî û bêdengî bi ser pêçeka xwe da xwar bû û bi du çavên sistemakî lê nerî. Xwest ramûsanekê bi herdû lêvên tenik ji hinarkê menalê xwe bi dize, lê dilê wê ew ragirt ; -"Bila kurik di xwa xweya şêrînde be", tani şîrê memkên germ hênik bibe.

Bi ser dergûşê de ma tawandî û awirên xwe jî pêçekê ne birîn. Çûnûhatina hilma kurik sêr û temaşe dikir. Hin bi hin mijûl bû û kete nav gomanên kûr û dûr de. - Menalê xwe mezin dikir û rê dikir ber cot û paletiyê bo alîkariya bav.... rê dikir dibistanê, da xwende û zane raba û karê dilîti neke. Wilo nav li cot û paletiyê dikir. Carna jî kurê xwe karkerekî bizend û bend di dît..... di dît ku tivinga ber hûr li milaye û bi heval û hogirên xwe re bi çîyan ve berjor dibe, di nav dar û devîyan de winda dibe. Hinga dît balafireka helikopter li ser wî û pêşmergekî bi wî re di rêse. Xwest bi dengê bilind li wan bike hewar û fîxan, lê dengê wê di sebeta sînga wê de bela bû û derneket....

Li pêçeka xwe nêrî ku çawa çavên menalê wê di kutkutîn û bê deng li diya xwe di nêre, weku hebûna diya xwe bi hilm û bêhna wê bi nase.

ARO



\*\*\*\*\*

## ZANÎNA KALAN

Qasimo yek ji cotkar, palavan û xerzikvanên Kurd e. Li gundê Dekşûriyê rûdine. Bi temenê xwe, ketiye çaryeka dawî ji sedsala xwe ya pêşî. Yek ji parêstên wêjeya Ahmedê Xani û Melayê Cizeriye. Lê "çavan serî li min gerandiye" di bêje.

Bi daxwaziya nêwerê kovara Stêr hinek zanînen xwe, yên kevn pêşkêşî kovarê dike. Ji wan ; Rojnama salêyê - Bihar Havîn, Payîz û Zivistan.

Wê her kejek ( demsal ) ji kejen salê di hejmarên Stêr de bêne çapkirin. Keja pêşî jî li ser biharê ye.

BUHAR : "Buhare, çiçek û gul û dare." "Buhare dewli dare."

"Buhar bûka salê ye, xemla rengî tim lê ye."

"Ne Zistan û ne payîz, ne havîn û ne payîz..."

"Buhar dilan dike zîz."

- "Sedên gotinên wek van, li ser buharê hatine gotin, lê tev di bîra min nayên." Qasimo destpêkir.

"Destpêka Buharê Avdara. Rojîn ji rojên Zîpan ( rojên dawîya Zivistanê ) dikevin serê Avdarê. Serma van rojan pir diware. Barana wan jî pire û lehiyan radike, lewra dibêjin ; 'Zîpan zîpedarin, bibarin - nebarin her xedarin'."

- "Reşeme heyva berî Avdarê ye. Bi rojên xwe kine, 28 an 29 rojin. Lewra " :

"Reşemê gote Avdarê, 'bide min sê rojên xedarê, da gîskê ji latê bênim xwarê'."

Paşî ku zîp derbasdibin germî destpêdike. Ji vê yekê dibêjin : "Avdarê berf giha gulha darê, nema heya êvarê."

Bî pazdehê Avdarê re tîrsa sermayê nema dimîne û hinbihin germa tîrêjên rojê xweş dibe. Û dext û geyayên çolê roj bi roj geştir û xweştir dibin.

21'ê Avdarê roja kêf û şahiyê bû. Di vê rojê de digotin :

"Bîst û yekê Buhara, jîna Kurd nake kara."

Bi danepazan re keç û xort, zarok û pîrek tev derdiketin nav dexlan û daran, ber çem û zînanan. Dîlok digotin, govend digerandin û helperk dikirin, hesp di berdan cirîdan û siwaran pêlawaanî dikirin. Kal û pîrên gundan, wek kundan, bi tenha xwe diman. Ew jî li ser zûrçik û geyan, wek her buhar bi dam û nehberk û çûlek (kortik) di leyistin. Niha ev tişt nimane. U şûna wê şahiya kevin, kûl û derd hêlînen xwe di dilan de çêdikin.

Ji 25'ê Avdarê re Basimbar dibêjin.

"Basimbarê ku baran barî, kerê şixrê (şalên şap û dextê na) di ber re nalî û got : 'ax li min û vî halî !'."

Eger dexil wek guhê mişk jî be, ku Basimbarê baran bi bare,wê çêbibe û hinga sap û şixrê barên kera pir dibin.

Her peşkek ji barana Cotanê (Nisan) bi zêrekî ye, lê pir caran reşî, bi rengê terez û teyrokê dibare. U dexlan wêran dike. 14'ê Cotanê werselek bi navê ( Sorê Sultanî ) heye. Di-bêjin ku mîrek ji mîran, bi alpîkariya du zîran cotek gayên zêrîn bi nîr û umbûrên zîvîn çê kirin û pêk anîn. Li eywanê pêş-kirin û di nav civatê de danîn. Mîr pirsî ; "Gelî kesên civatê, bêjin min kurê Fatê, eger bi destê xwedê jî tiştê wa tê ? " Kalekî ji kalên civatê xwe rakir ser çokan, besiv ber bi mîr hilda : "Tavek ji tavên cotanê hemberê mal û bermalê Xurasanê û cotên gayê li eywanê, li meydanê."

Piştî vê werselê, nema dexil bi xêra baranê ne. Û av ne pêwistîye, bi tena xwe bi bayê hînik xwedî dikin.

Reşiya Buharê (nexweşiya wê) di mila Gulanê deye. Gava di vê heyvê de baran dibare, dextê dike korik (liba genim reş dibe), di şewibûne (pûç dike) û dike zeng (gava ji xwar ve dibe weke zingarê).

Ba û barana cotan jî darên terwandan xiradike û barê wan kêr dike - ku lîlkên daran û mêwan diweşîne.

Çiças peyv li ser Buharê bîn gotin, pirtir jî dimênin. Bi kurtî ; Buhar, bo zarok û xort û keçan, kal û pîr û koran jî buhare. Bo dext û geya, pez û sewalan, dar û rezan jî buhare. Zarok bi kêf û şane, ji ber ku karê herbiçavan bida-nehev : Gulan, mijmijokan, derpê kêdîkan, şinêrekan, penîrokan, çavçêlekan, şoçilan û sûrimê....

Malxweyên malan bi kêf û şane, ji ber ku her tişt bi pîrbûn heye : Şîr û mast û penîr, çurtan û dew û mehîr. Tolik piçok, strîzerk, sersipik, ginêber, gwîriz, û kereng.... Her wa jî ; Geyakê sêva, pûng, hîro wek dermanan.

Xort û keç jî bi kêf û şane, ji ber ku bi hev re di çin : bêriyê, badana rêşî, aşêfa zîwanê, xwarina qîfaran, seyranên nav çiçek û gulan, nav nefel û indekoyê.....

## Pêkanîne REZO

SÎRÎNC : Eger win, yan yên nasên we tiştê din li ser herçar kejên salê, Buhar, Havîn, Payîz û Zivistanê dizanin em hêvî dikin ji mere rêkin, ji bo zenginkirina vî heyberî.



## Xwendevanên delal !

Li ser rêzimanê zimanê Kurdî-Zaravê Kurmancî sê dîtînan hatine avakirin. Ew jî bi destê;

1-) Mîr Celedat Bedirxan û Dr. Kamîran Bedirxan. Wan her dû nivîskarên bi dîtineka kûr û modêrn destûr û termînologîya ziman danîn. Ew pir zane bûn û lîteratûr û zimanê pir milletên pêşveçûyî nasdikirin. Vê yekê dîtina wan ferehtir û bicihtir kiriye.

2-) Reşîdê Kurd di pirtûka xwe de li ser bingehên rêzimanî dîtineke başçe nîşan dike û pirtir ji Kurdên ku bi zimanê Erebi dizanin re nivîsiye. Termînologîya rêzimana wî danî nabe were serguh: avêtin, di vî çaxê ku zaravekî Kurmancî lîteratûrî tê formule kirin.

3-) Kurdên Sovyet. Ev dîtîne rêzimanî, li jor bûrî, hatine çapkirin û belakirin. Eger çetinbe jî xwendevan dikarin peyde bikin. Lê mixabin, ku kar û barekî pir giranbiha di warê zimanê Kurdî de Kurdên Sovyet kirine, dîtîne nû û giring danîne lê şûna karê wan pir bela ne bûye. Sedema vê nebalabûnê nemaze sînorên sîyasî û nezarîbûna alfabêta Ezbûkiyê (Rûsî). Êdî pir xwendevan ji karê nîteratûrî yê nî giring bêpar dimînin.

Gihandin di nav tevgera lîteratûrî Kurdî pir gereke. Û xebateke bê sistayî jê re dive. Ji ber vê yekê û ji bo ku dîtina Kurdên Sovyet li ser rêzimanê Kurdî ji xwendevanan nependî nemîne, emê pirtûka Qenatê Kurdo ; Gramatîka Zimanê Kurdî Ser Zaravê Kurmancî ya bi tîpên Ezbûki hatiye nivîsandin guherînin tîpên Kurdî (Latînî) û kine xelek li pey hev di hejmarê vê kovarê de pêşkêşî xwendevanan bikin. Xwendevan wê hin guhartina di awayê nivîsandinê de di vê pirtûkê de bibînin. Ji ber ku ev guhertin dihingivne dîtina rêzimanî, me dest nedayê. Em hêvî dikin haya xwendevanan ji vî tiştî hebe.



\*\*\*\*\*

Sirincek : Ji rupelê 10 û virde tîpê l û î hatine guhertin û bone î û î .

## QANATÊ KURDO

### GRAMATÎKA ZIMANÊ KURDÎ ( Ser Zaravê Kurmancî )

SONA KOMED V - VI

ERÎVAN SALA 1956

Pêş xebera dudya.

Paşî neşîrbûna "gramatîka zimanê Kurda ya kurt" ( ser zaravê kurmancî ) derbazbûn şeş sal. Di pêşxebera wêda min sala 1949 nivîsîbû, ku "ez hevîdarim û ji xwendekar, xwendevan û dersdarêd zimanê Kurmanca lavadikim, ku fikra xwe derheqa kêmasiyêd gramatîka mînda binivîsin."

Hingêda heta niha her nemek min stand ji hev. Tîtalê Mûrad derheqa termînêd "navê cînsê nêr (mêr)", "navê cînsê jin (mê)", di gramatîkêda ez didim xebitandinê hin termînê "Navê Cînsê Mêr", hin jî "Navê Cînsê Nêr". Usa jî didim xebitandinê hin "navê cînsê jin", hin jî "navê cînsê mê". Tîtal nivîsîbû, ku ez ji van termîna bidim xebitandinê "Navê cînsê mê, navê cînsê nêr".

Ulîmdarêd me - Emînê Evdal, Hacıyê Cîndî fikra xwe baş derheqa gramatîka min da gotine û nivîsîne.

Gerek bêjim, hevalê Emînê Evdal nêta xwe aliyê başkirina gramatîkê da ji min re gotiye û çend cara di nema jî min re nivîsiye. Ewî sê pîrsêd ferz danîbûn ber min. Ew hersê pîrs evin ; a-) Di gramatîka bona komêd V-VI da gerek bê nivîsandinê tercîma termînêd gramatîkî bi zimanê Kurdî-Ermenî-Ursî ; b-) Gramatîkê da gerek bê nivîsandinê çanûnêd rastnivîsandinê di zimanê Kurdî da ; c-) Gramatîkê da gerek kurt bê nivîsandinê derheqa sintaksîsê ( lihevhatîna xebera û çêkirina cûmla ) da.

Wextê Hevalê Emîn derheqa van pîrsa da digot û dinivîsî ji min ra û nemê da ev pîrs anîn bîra min, ewî herdem digot ; "Van pîrsa ez didim pêşberfî te çawa xwestîna dersdarêd şkolêt Kurdê Ermenîstana Sovêtîê ". Ez bi xwe jî çalîm bi giliyê wan gotîra.

Bona rastkirina kêmasiyêd gramatîka xwe û başkirina wê min ev her sê pîrs bi dil û can qebûlîkrin, û ew qedandin. Divê gramatîka bona komêd V - VI da.

Gerek bêjim, min çend qise û serpehatiyêd teze û ferz jî kirine nav gramatîka naha.



Bi fikra min termîned gramatikî yêd ku min sala 1948 da di gramatikê da nivîsîbûn, piraniya dersdara, xwendevana û ulimdarêd Kurdêd Sovyetistanê qebûlkirine. Ulumdarêd me - Hacıyê Cindî û Çerkesê Xudo bi zar fikra xwe erêtî derheqa termîne gramatika min neşirbûyî sala 1949 da ji min ra gotine.

Ser vê yekê ez termîne gramatika xwe ya berê di vê gramatikê da di hêlim û didim xebitandinê.

Di vê gramatikê da min çend termîne teze di dereca sintaksîsê da dane xebitandinê. Termîne vê derecê heta naha zimanê me de tunne bûn û nehati-bûn testiqlkirinê. Dibe vê derecê da kêmasiyê min hebin.

Ez hêvîdarim, ku xwendekar, xwendevan û dersdarêd zimanê Kurdî fikra xwe derheq gramatika min da binivîsin û nîşan bikin kêmasî wê.

Adrêsa min Lêningrad - Divortsovaya Navyêryêjniaya 18 Institut Vostoko Viyêdyênîyaya - Kurdoyêv K. 1955.

\* \* \* \* \*

Ji tîpên Ezbûkî ( Rusî ) XELATÊ wergerandiye tîpên Latîni.



## MORFOLOGÎA

### DERHEQA SEWTADA

---

Zimanê Kurdî de di cûre sewt hene ;

1-) Cûrekîre di bêjin sewtêd danganî ;

2-) Cûrekîre jî di bêjin sewtêd bêdanganî.

Her sewteke herdu cûra fikra wê xeberê da heye.

#### Sewtêd danganî

1-) Wan sewta re di bêjin sewtêd danganî, yê n ku dengê wan hene. Setêd danganî dirêj û kurt tên setdayînê. Ew usa jî bilind û nizim tên setdayînê. Ew cîyê ku set lê peyda dibin û derdikevin, wî cîra dibêjin cîderka sewta. Devê merîya da cîderka sewtêd danganî li du cîyana. Çikî sewtêd danganî devê meriyade lipêş peyda dibin, lê çikî jî sewtêd danganî devê merîya da li paş peyda dibin. Ew setêd ku cîderka wan li pêşe, wan sewtara dibêjin sewtêd danganî yê rêza pêşîn (sewtêd pêşki), lê ew sewtêd, ku devê meriya da cîderka wan li paşe, wan sewtate dibêjin sewtêd danganî yê rêza paşîn (sewtêd paşki).

#### A. Sewtêd Danganî yê rêza pêşî.

1-) e: eyar, enî, jer, rewîr, terî, menî, ber, dew.

2-) o: olo-lo, ode, oba, bona, dor, sor, şiro, to, Simo.

3-) û: ûrt, ûmût, dû, rû, hûn, biçûk, dûv, kûvî, rûvî.

4-) a: alast, ap, ar, ba, bav, baran, bîra, çira, sal.

#### B. Sewtêd Danganî yê rêza paşîn.

5-) î: îro, îmî, bîr, nîr, kanî, kirîn, birîn.

6-) ê: êvar, êl, êrmanî, dêr, dirêj, pê, rê.

7-) u: kur, tu, hurmê, ruh, qul, xulam, şuxul.

8-) e: ez, erê, ey, dey, serek, ber, gede, pale.

9-) i: kirin, birin, bira, çira, simil, bizin, keçik, mezin.

## Sewtêd bê dengani.

2-) Wan sewtara dibêjin sewtêd bê dengani, yêd ku dengê wan tune. Sewtêd bêdengani nedirêj tên sewtdayîne, ne jî kurt tên sewtdayîne. Yekê jî, ew usa jî ne bilind tên sewtdayîne, ne jî nizim tên sewtdayîne.

Sewtêd bê dengani ji aliyê cîderka sewtdayîna xwe da parvedibin ser van komêd jêrn :

### A. SEWTÊD JI ZELOOKÎYE PEYDABUYÎ.

Wan sewtara dibêjin sewtêd ji zelqokîyê peydabûyî, yêd ku peyda dibin wexta hevzelçandina organê sewta.

Sewtêd ji zelqokîyê peydabûyî evin ;

b, p, p̄, d, t, t̄, k, k̄, g, c, ç, ç̄, q.

- 1-) b: ba, bav, bira, baran, reben, bend, beden, berbûk.
- 2-) p: pîr, pîvaz, payîz, pez, parzûn, çep, lipitîn.
- 3-) p̄: p̄ar, p̄îr, p̄ere, p̄ilta, p̄oxîn, p̄arxan.
- 4-) d: dar, deng, derd, derdan, dadan, dâr, dîwan.
- 5-) t: tîr, to, tu, teji, ritil, pitê, xet, met.
- 6-) t̄: t̄er, t̄o, t̄ilî, t̄ev, t̄emam, t̄a, t̄awa, t̄ûr.
- 7-) k: kanî, ka, kerî, keçk, çêlek, berek, kon.
- 8-) k̄: k̄er, k̄ûr, k̄ilit, k̄êran, kar, kef kas.
- 9-) g: ga, bager, deng, giran, gilî, gûnî, gor.
- 10-) c: cî, cêr, kurmanç, tac, brinc.
- 11-) ç: çar, çax, birçî, çima, çê, çû, çîm.
- 12-) ç̄: ç̄ira, ç̄av, ç̄ivîk, biçûk, ç̄ûl.
- 13-) q: qaz, qûl, qepçapç, qasî, çiqas, req, beq.

### B. SEWTÊD JI QELIŞTEKÎYE PEYDABUYÎ.

Wan sewtara dibêjin sewtêd ji qeliştekiyê peydabûyî, yêd ku di qelişteka nav devra peydadibin û tên sewtdayîne.

Sewtêd ji qeliştekiyê peydabûyî evin ;

s, ş, f, v, z, j, y, x, x̄, w.

- 1-) s: sar, ser, sal, pirs, weris, sî, fesal.
- 2-) ş: şîr, şivan, reş, beş, beroş, qelaştin.
- 3-) f: fêl, fîna, ferz, berf, fêriz, def, kef.
- 4-) v: vî, bav, av, dev, kevî, nevî, xav, rev.
- 5-) z: zer, zîm, zinar, kinêz, pez, rez, gûrz.
- 6-) j: jîr, jar, jor, jêr, dirêj, bajar, rijî, jar.

- 7-) y: yar, heyr, deyîn, bûyîn, berayî, bilindayî.  
 8-) x: xal, xatî, xûşk, xûn, rex, berx, wext, bext.  
 9-) ẋ: aẋa, baẋ, qedeẋe, meẋelbûn, deẋelî.  
 10-)w: were, wêderê, wêran, derew, dêw, xew, saw.

### C. SEWTÊD ZELQOKIYÊ NÎVDENGANÎ.

Wan sewtara dibêjin sewtêd zelqokiyê nîvdenganî, yê ku sewtdayî wan da organêd cîderka bi hevva tê n zelqandinê, û hinekî ji sewta danganî pêra derdikeve.

Sewtêd zelqokiyê nîvdengî evin ;

l, m, n, r, ʀ.

- 1-) r: berî, sar, kerî, nêrî, baran, cînar, dar.  
 2-) ʀ: ʀeş, rast, ber, keʀ, cêʀ, birek, taʀ.  
 3-)m: merî, mal, merem, tûm, kom, kam.  
 4-) n: nan, nîr, nivîn, birîn, cînar, kêran.  
 5-) l : lal, sal, belek, dil, kêlek, dêl, sêl.

Dûmahîk heyê.

\* \* \* \* \*



## EBDULLAH PEŞÊW

Amadekirina Agrî.

Helbestvanê Kurdî law Ebdullah Pêşew yek ji pênuşên herî hêja yên gelê Kurd tê jimartin. Ew behremendîyek giranbihaye, û ewê bi berhema xwe wê-jaya Kurdî pir dewlemendbike. Nemaze di warê helbesta Kurdî a nû de.

Peşew li Kurdistana Iraqê hatiye dinyayê. Ew ji nifşê şoreşêye. Wî bindestî, sitembarî, êş û xembariya Kurdan kêşaye. Wî kuştin, qirkirin, û sirgûnkirina milletê Kurd bi çavan diye, û bi xwe jî derbeder bûye, çûye welatê xerîbiyê. Vê tevî, wijdanê wî hejand, û kîna dijmin di dilê wî de xurtkir. Ev hêra bi xweş di helbestên wî de diyar dibe.

Weke piraniya helbestvanên merhela şoreşa neteweyî, Peşew jî li hemberî kolonyalîzmê. Imperyalîzmê û paşverûtiyê şer dike. Giyana berxwedanê û niştimanperweriyê li ba Peşew pir bi hêze. Peşew bi awayê helbesta serbest, ristên xwe dinivîse. Lewra mûzîka helbestên wî li gûhan pir xweş tê. Zimanê wî hêsa di herike. Her weke ku ew bi zarê Kurmanciya başûr di nivîse. Lê Kurdên bakur jî di helbestên wî di gihin. Di ristên wî de, pir wişeyên zaravaya kurmanciya bakur derbasdibin. Helbestên wî xizmeteka bê hempaye a bona bihêzkirina rihê yekîtiya niştimani.

Peşew du dîwan bi navê " Şewnamey Şairêkî tînu " û " Dwanze Wane bo minalan ", çapkirine. Helbestên wî rupelên gelek rojname û belavokên rêkxiravên siyasî mîna " Hawkarî ", " Birayetî ", û " Birî Nû " xemilandine. " Dwanze Wane bo minalan " di navbera salên 1970-1973 nivîsiye. Paşê, piştî hinek guhartinan, wî ev dîwan li Berlîn sala 1979 an çapkir. Wî ev serinca jêrîn bi destnivîsa xwe, di dîwanê de nivîsi ;

" Her rêkxirawêkî Kurdistani û her Kurdekî azadxwaz de twanê em komele şîire bilav bikatewe û xawenî bê. Qazancî em dîwane bo pêşmergekanî Kurdistani Êrane.

12.10.1979 "

Peşew çiqasî niştimanperwera, hewçasî jî şoreşgere. Ew ne tenê rêjûmên dagîrker, kedxwar ku kikumdariyê li Kurdistaniê dikan, dijmin di bîne, lê belê zirara hindir, kevnepereşt, derebeg û caşên Kurdkuj ne kêmtir di bîne. Lewra hêviya wî hemû bûye nifşê nû, xwediyên bîr û baweriyên nû ên şoreşgerî. Madem zehmetkêşên Kurd, karker, gundî û ronakbîrên şoreşger, ewin ên ku barê şoreşê hildane ser milê xwe. Gereke naxwe pêşewerî ji wan be. Ew pê-

şeweriya burjuwa û feodalan êdî red dike. Di pîrse ka van xeynî wêranbûn,  
şerpezetî, kul û êşê çî bi dest xistine :

Minalëkan !  
Tu xwakey bi pîrsin lēyan

bipîrsin le waney, çawyan,  
tînî na gate ber pêyan,  
metîrsin, bipîrsin, bilên,  
"lê seferî dūrgey xwēna,  
bo minalên çîtan hēna !  
pēman bilên, çîtan hēna ? "

Helbestên Peşêw wanê ku kirasê pêşverûtiyê li xwe kirine û birastî bûne  
dûvê burjuva hikimdar, tazî dikin. Ewê dostê Kurd be û bi rastî bona qezenca  
gelê xwe bizavê bike, pêwîste şerê bona demokrasiyê gêş bike û mafên gelê  
Kurd nas bike û bi parêze. Ew jî pêşverûyên sexte re dibêje ;

Eger minîş dawa bi kem  
serbest bijîm weku piyaw  
le Kurdistanêki azad  
nek letlet û pêşêlkira  
bo şovênî û xoperestim ?  
de pêm bilê xoşewistim,  
bo sovênî û xoperestim ?

Peşêw sînorên siyasî ên destkird, ku li gora wan Kurdistan bûye çar parçe,  
nas nake. Ew nîvçareyan rast nabîne. Tenê Kurdistaneke azad, yekbûyî, û ser-  
bixwe çara herî diriste. Xeyn jî vê her çareke din bona qezenca çînên ser-  
destin, çî Kurd û çî biyanî. Di bêje ;

Ëwen sibey  
le Qamişlî  
le Diyarbekrî şêx Se'îd da  
le Silêmanî brîndarda,  
le Mehabadî ( Qazî ) da  
be yek felsefe pê degen  
gişt tê degen :  
Ewey Kurd bê, newey nwê bê,  
de bê têşûyî  
rêyî yekêti Kurdî pê bê.

Dîsa di bêje ;

Ewen sibey  
sinûrî deskird de şkênin.



Hêviya peşêw pir xurte, pir bi hêze. Ew ta dawiyê bawere ku wê serkeve. Xebata çekdarî, derpêşkirina çekan hemberî çekan, rêyeke dirist dibîne, bona çareserkirina mesela Kurdistanê. Ewê bi zorhatî birin, ne bi zor be nayê standin ;

Serdekewin  
çonke dwênî,  
tope qurêkî deskirdim  
daye dest minalêkî şûşe  
tifengêkî biçkolaney lê dirust kird !

Doz dike gotin û kirin ji hev cê nebin !

Ewey dilopêk xwênî çand  
tabloyekî bo xoy nexşand  
Ewey tenya  
hawarêkî li dem derçû  
goyî li seday dengî xoy bû.

Pêşmerge û şehîdbûn, maneke wanî mezin li cem Peşêw heye. Pêşmerge yanî mêrxasî, welathezî, û mirovperwerî. Yanî xebat û şoreş. Pêşmergeyati pêpelûka herî bilinde, mirov dikare bi gihiyê. Welatek û mileteki şehîdbûn ; ji wanre bûye nanê her roj, bê goman dê mirovê şehîd cihê xweyî layiq di dilê lawên wî welatîde, bigre. Deka em bi hev re vê wêneya ciwan û bedew bi xweynin ;

Minalekan !  
Senger senger çiyakan geram  
goyem lê bû komelêk qewan,  
le naw sengerêkî çol da,  
le pêşmergey şehîd dedwan !

Wekî din jî, Peşêw mirovekî aştxwaze, aşiqê bedewiyê ye, di xwazê jiya-  
neke bê serêşe. Belê nebûye ku kevoka aşitiyê li ezmanê welatekî jêrdest,  
belengaz û perîşan bi fire. Eger aşitiyê bi destxin, gereke azadiyê berî bi dest-  
xin dergêhên azadiya sor, tenê bi legên xwînî têne lêdan, çawahelbestvanekî  
Ereb di bêje. Peşêw di bêje ;

Wek bîstûme  
ew kotre mangirtûwa  
le asmanî wilatêkî  
bê alada  
be şrixey tifeng nebê,  
qet le şeqey balî nada !

\*\*\*\*\*

TE'RÎB

Le esmanewe nehatûm

Min mê wanim.  
Min mê wanî  
Sêber qursî Kurdistan nim.  
Ber le mêjû,  
Kaniyêk bûm lêre derbûm.  
Ber le mêjû,  
agirek bûm lêre helbûm.

Barken biron...  
Kani - awekan cige le min  
Kesê kî tir têr aw naken  
Dargwêzekan cige le min  
Bo hîç kesêk  
Sêberî xoyan helnaxen !  
Barken biron...  
Zewî ê meş  
Danî ê we lê şîn nabêl  
Mêrgî ê me,  
Le jêr pêyî garanekantan wek agirin.  
Ta dartûşman yazî debîn,  
Colaneyek bo minaltan ranagirin !

Barken biron...  
Mêwey dirextekanman kale,  
Awman swêre,  
hengwînman be demtan tale !

Barken biron...  
Barken biron..

\*\*\*\*\*

Çend wişayên nenas : Sêber : Sih Qurs : Giran Mêjû : Dîrok.  
Cige : Xeyn Yaxî : Enirî Colane Deydîk.  
Dirext : Dar Swêr : Şor.

## SERBAZÎ WÎN

Ke wefde de çête şwênê  
Bo sergorî serbazî win  
tacegulîneyek dê nê

Eger sbey  
Wefdek bête wilatî min,  
Lê m bi pirsê ;  
"kwanî gorî serbazî win ? "  
Delê m :  
- Gewran !  
le kenarî her cogeyê,  
Le ser sekoyî her mizgewtê,  
Le ber dargey  
ler mafê,  
Her kilîseyê,  
her eşkewtê,  
Le ser zinarî her şaxê,  
Le ser directî her baxê,  
Le KURDÎSTAN -  
Le ser her bîste zemînê,  
Le ser her geze asmanê,  
Me tîrse !  
Kemê k ser daxê û  
Tacegulîneket danê !

Mosko 1979.

Serbaz: Leşker, Win: wînda, Tacegulîne: Taca gul,  
Gewrem: Mezinê min, Coge: Gok, Seko: Dikan,  
Şax: Çiya, Bist: Bost, Geze, Gaz, Kemê k: Hinekî.

\*\*\*\*\*

### ALA

Dostekanim ! baş bizanin  
Dujminanim ! baş bizanin:  
Çend bawerim be Zerdeşt û  
Be awêsta û be xwa heyê  
Hezar hendeş:  
Bawerim be helkirdinî ala heyê

Xwa: Xwede, Hezar hendeş: Hezar carî wîsa, Helkirdin: Hildan.

## STRANA NEWROZÊ

Emrojî salî tazey Newroze hatewa  
Cejnêkî konî Kurde be xweşiwe hatewe  
Çend sal gulî ê wayî  
Yê me pê pest bû tak û par  
Her xwê nî lawakan bû  
Gulî alîna û buhar

Emrojî salî tazey Newroze hatewa  
Cejnêkî konî Kurde be xweşiwe hatewe.

Ew rengê sore bû le asoyî bilindî Kurd  
Mejdayî beynanî be gelî dûr û nezîk bird  
Emrojî salî tazey Newroze hatewa  
Cejnêkî konî Kurde be xweşiwe hatewe.

Newroz bû agirî wê hayî xiste cergewa  
Lawan be eşqe çûne berew pire mergewa  
Emrojî salî tazey Newroze hatewa  
Cejnêkî konî Kurde be xweşiwe hatewe.

Wa roj helat le benderî  
Berze welatewe  
Xwîni şehîda le nîvî şev  
Şewqe datewe

Emrojî salî tazey Newroze hatewa  
Cejnêkî konî Kurde be xweşiwe hatewe

Ta êsta rûwî nedawe  
Le rûwî tarîxî mîletan  
Oelxaniagula sîngî keçan bêye helmeta  
Emrojî salî tazey Newroze hatewa  
Cejnêkî konî Kurde be xweşiwe hatewe.

Pênawê bo şehîdî wetan  
Şiwen û girîn  
Namirin ewan, ewan le dilî mîletan ejîn  
Emrojî salî tazey Newroze hatewa  
Cejnêkî konî Kurde be xweşiwe hatewe.

\*\*\*\*\*

Ez derketim sala par  
 Di Tirkî re wek her car.  
 Li çayxanê danîştîm,  
 Ji kul û derdan ez miştîm.

Hate ser masa min yek,  
 Yekî hovî çarlepêk.  
 Ji gotinê n wî'n rîjî,  
 Serî li min di pîjî.

Qutî nêrî avîse,  
 Behna devî "necise".  
 Simbêlê n wî weke six,  
 Şifça serî silek rîx.

Min got navê te çiye ?  
 Got: Kemal'ê Tirkiye !  
 Keserek hat dilê min,  
 Agir xiste nava min.

Etatûrk li bir anî,  
 Şêx Saîdê Piranî.  
 Min li xwe neda der,  
 Ku ez tev bûme keder.

Me dest pê kir bi xweşî,  
 Rewşa cihan kir teşî.  
 Min got: çep û wî got: rast,  
 Tani rûnişt xak alast.

Got: dawya dinê mirin,  
 Kesên sorin gawirin.  
 Wê olderên misilman,  
 Hemî herin bihiştan.

Ew gawirên por gijik,  
 Hemî wê bibin qijik.  
 Me ev salfe tev berdan,  
 Em hatin rewşa Kurdan.

Wî ji min di pirsî,  
 Çima wîlo bi tirsî ?  
 Min go tirsî min niye,  
 Gelo tirsî ji bo çiye ?

Ma Kurdên me çawanin ?  
 Kurt.. Kurt.. Kurt.. aaa...  
 Tirkên serê çiyane.

Min got: eger ne nasin,  
 Lê bo mafên xwe xasin.

Min ev gotin jê re got,  
 Çavên wî bûne pizot.  
 Van hêrizên pir giran,  
 Xwe berdane ser polan.

Xwedyê serê bê hişe,  
 Weku dîk xwe nepîşa.  
 Yek ji min û yek ji wî,  
 Bi Tirkiya xwe'y rizî.

Me gotin dane rû hev,  
 Weku dikan çûn ber hev,  
 Me destê xwe lev hilda,  
 Wî ji min girt û neda.

Derket derê çayxanê,  
 Ewe xwedyê eywanê.  
 Wî bakire cendirman  
 "Bûrim, bixwin şawirman".

Ta wan xwerin da ber dil,  
 Tirko ji wan re kîr kil.  
 Lingek li pêş yek li paş,  
 Min bazda wek bertelaş.

Gavên xwe kirin şelîf,  
 Ode li xwe kir kilit.  
 Li pêşya min rêke dûr,  
 Ez bi lezim keser kûr.

Ev bû salfa mi û Kemal,  
 Bi mitala gîham mal.  
 Min soz dabû bi canî,  
 Tu car nakim xîzanî.  
 Tu car nekim etlahî,  
 Ta derkeve ronahî.  
 Ta Kurdên me bibin yek,  
 Hildin ala xwe ' y belek.

*I T Ê R* ★



A GENERAL CULTURE MAGAZINE

NUM. 1

YEAR 1983